Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1300 | 20-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Pêwîst e ciwan siberoja xwe bi destê xwe xêz bikin

Navenda Nûçeyan/ Qamişlo



**Rêveberiya Nevenda Geşepêdana Ciwanan ya Qamişlo Henan Mûrad diyar kir ku di sala 2017'an de Navenda Geşepêdanên Ciwanan hate avakirin û wiha got: "Armanca me ji avakirina vê navendê ku em ciwanan perwerde bikin, derfetê kar û siberojeke baş ji wan re peyda bikin."**

Navenda Geşepêdanên Ciwanan di 2017'an de hatiye avakirin, di vê navendê de perwerde ji bo ciwanan tên dayîn. Navenda Geşepêdanên Ciwanan ji bo tevahî ciwanan weke derfetek ji bo xwe pêşxistinê ye, ji ber ku gelek ciwan di nava civakê de ji kar û xwendinê dûrketine, ji bo vê yekê, ev ji bo wan derfetek e. Gelek perwerdeyan ji bo ciwanan tê dayîn, herwiha gelek beş hene ku ciwan xwe tê de tomar bikin û bi dawîbûna perwerdeyê re kesên serkeftî bawername li wan tê belav kirin.

Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Nevenda Geşepêdana Ciwanan ya Qamişlo Henan Mûrad ji Rojnameya me re axivî.

**'perwerdeyên cûr be cûr ji ciwanan re tên dayîn'**

Henen destnîşan kir ku ji bo ciwanan gelek perwerde tên dayîn û wiha got: "Di nava civaka me de ciwanên ku derfetê Kar û xwendinê bi wan re nînin gelekin, ji ber vê yekê jî em perwerdê didin wan, perwerdeyên me gelek beşan digrin nava xwe û bi rengekî serkeftî têne meşandin, Kimbiyoter, Berberî, Kiwafêra, Ragihandin, dirûtin, zimanê Ingilîzî û Lênerîna Telefûnan e. Perwerde du mehan dirêj dike. Herwiha di nava van perwerdeyan de perwerdeyên bîrdozî ji bo ciwanan tên dayîn mîna; li dijî madeyên hişbir, şerê taybet û zewaca bi temenê biçûk tên dayîn. Kesên ku beşdarî perwerdeyê dibin, ji temenê 14 salî heya 35 salî ne. Ev perwerde li sê navendan tê dayîn, Til koçer, Qamişlo û Hesekê."

**'Armanca me pêşxistina behreyên ciwana ye'**

Henan Mûrad diyar kir ku armanca me ji vê perwerdeyê pêşxistina behreyê ciwanan e û wiha domand: "Armanca me ji van perwerdeyan pêşxistina asta hizrînê li cem ciwanan e". Di pêşxistina civakê de rola ciwanan girîng e, ji ber vê yekê armanca me ew e, ku ciwan di asta pêşengtiyê de cihê xwe bigrin. Dijmin dema ku êrîş li ser civakekî an jî herêmekê dike, di destpêkê de êrşî ciwanan dike, ji ber ku baş dizane ciwan dînemîka ku civakê bi rê ve dibe ye. Bi van perwerdeyên ku ji bona ciwanan têne dayîn, ancax ciwan bi vê yekê karibin li hemberî şerê taybet û yê derûnî têkoşînê bikin û xwe ji bandora wê rizgar bikin.

**Pêşeroj û zehmetî**

Rêveberiya Nevenda Geşepêdana Ciwanan ya Qamişlo Henan Mûrad axaftina xwe wiha qedand: "Di pêşerojê de di plana me de wê vebikin beşên nû mîna; beşa mûzîk, wênexêzî û tenduristî jî hebe. Em dixwazin hin beşên din jî di dema pêş de vekin û ji bona vê yekê emê her tim di nava hewildanêdebin.




# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 2 cihên şûnwariyê...(4)

Reşo Mihemed / Qamişlo

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê Serşoka Minbicê ya kevin û Til Bêder e.**




**Serşoka Minbicê ya kevin:**
Ev serşok li aliyê başûrê rojavayê Mizgefta Hemîdî (Mizgefta Mezin) dikeve. Ew Ji mizgeftê bêtir nêzî avahiya Seraya ye. Ew li nêzî Meydana Giştî li rex Xewgeha Medîneyê ye. Ji ber ku serşoyeke biçûk heye ku li pişt Mizgefta Elaî ye û bi ava sar dixebite, navê vê mizgeftê kirin Mizgefta Mezin. Ev mizgeft yek ji cihên şûnwarî yên nû ye. Mirov dikare bibêje ku li bajêr ew yek ji nîşaneyên şaristaniyê yên girîng e. Ew dide diyarkirin ku xelkên wê herêmê guh didan paqijiyê. Li gor kolanên li wê deverê, şûnwarên wê serşoyê kevin in û berî serdema Osmanî ne. Xuya ye ev serşok hatiye çeksazkirin, ji ber ku di kolanê de hat diyarkirin ku li kêlekên serşoyê û li ser kûrahiya şeş mitreyan dîwarên veşartî di bin axê de hene. Tê pêşbînîkirin ku ew weke bingehekê ne ku ev serşoya niha li ser hatiye avakirin. Tu palpişteke xurt tune ye ku lingê serşoyê diyar bike, lê hin nîşane hene didin diyarkirin ku ev dever di serdemên curbecur de hatiye bikaranîn. Ev yek jî girîngiyeke dîrokî dide serşo û deverên derdora wê kevnariya Minbicê dide diyarkirin. Ji xwe her tim di kolanan de nîşaneyên şûnwarî li herêmê tên dîtin. Li gor ku xuya ye, ev serşo di sala 1904'an de li ser destê sultan Ebdilhemîdê Duyem hatiye avakirin.

**Til Bêder:**
Ev girê şûnwarî bi dûrahiya 35 kîlo metreyan li bakurê bajarê Hesekê dikeve. Ev gir di nav koma girên Cizîra Bilind de, yek ji girên herî mezin e. Rûbera girê sereke bi qasî 28 hektarî ye. Derdora wê jî digihêje 2 kîlo metreyan. Ew bi qasî 27.5 mitrî ji deştên derdorê bilindtir e û bi qasî 387 metreyan ji rûyê deryayê bilindtir e.

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Çiyayê Cûdî

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bixêriya wî dû nagire:**
- Rewşa wî ya aborî baş nabe; bextreş e; şansê wî nîne.

**Dinya hemû ka be, devê kerê min pê nabe:**
- Bextê min reş e; siûda min nîne.

**Ez dibêjim bira tu dibêjî kirîv:**
- Ez hingî xwe nêzîkî te dikim tu ji min direvî.

**Goza kor e:**
- Bextê wî reş e.

**Heywan hemû goşt dixwin bextê gur reş e:**
- Behsa kêmayiyên kesên din nayê kirin, behsa kêmayiyên wî tê kirin.

**Hêka wî bêzerik e:**
- Bextê wî reş e; şansê wî nîne; bêsiûd e.

**Ji kê re dibêjim birawo, ji min re dibêje biraxwaro:**
- Bextê min reş e; gotina min li her kesî tehl tê.

**Ji kuleka wî dû dernakeve:**
- Rewşa wî ya aborî baş nabe; bextreş e; şansê wî nîne.

**Min ji kê re got bira, ji min re gotin birakuj:**
- Bextê min reş e; gotina min li her kesî tehl tê.

**Navê gur derketiye rûvî dinya xirab kiriye:**
- Behsa kêmayiyên kesên din nayê kirin, behsa kêmayiyên wî tê kirin.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Xerîb Hiso: Konferans dengê pêkhate, ol û baweriyan kir yek



Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Xerîb Hiso da zanîn ku Konferansa Yekhelwesta Pêkhateyan ne care yekemîn e ku tê lidarxistin, çawa di dîrokê de hemû pêkhate, ol û baweriyan di Sûriyê de hev parastin, ev gav jî nûjenkirina wê ye.R-4

## 'Armanc bihêzkirina jin di aliyê perwerde û aborî de ye'



Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji 2014'an ve hatiye avakirin û di pêşxistina jinan de xwedî misyoneke bi heybet e. Rêvebera Projeyên Weqfa Jina Azad Viyan Elî da zanîn ku xebat û projeyên wan li ser bingeha bihêzkirina aliyê perwerde û aboriya jin tên meşandin.R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1300 | 20-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Pirsgirêkên xizmetguzarî û sedemên wê li Qamişlo




Li Qamişlo ji ber pirsgirêkên xizmetguzariyê yên mîna kêmbûna elektirîk, av û qalîteya nan welatiyên bajêr tengaz dibin. Di vê çarçoveyê de berpirsên saziyên xizmetguzariyê diyar kirin ku ew hewil didin li gorî derfetên heyî pirsgirêkan çareser bikin.R-6

# 'ÇARESERIYA DOZA GELÊ KURD DEMOKRASÎ YE'

Nûnerê PYD'ê li dewletên Iskendenafyayê Dara Ehmed destnîşan kir ku pirsgirêka herî mezin di Rojhilata Navîn de pirsgirêka gelê Kurd e û çareseriya wê jî bi pêkanîna demokrasiyê pêkan e. Herwiha Dara Ehmed anî ziman ku Rêber Abdullah Ocalan bi pêvajoya dîrokî ya 'Aştî û Civaka Demokratîk' zemînê aştiyeke mayinde ji bo tevahî gelên herêmê da avakirin.R-3



## 'Armanca me vejînkirina cihên dîrokî li Qamişlo ye'



Endamê Navenda Pargîn a Lêkolîn û Parastina Kevneşopan Cemîl Ehmed diyar kir ku 6 meh in wan dest bi amedekariyên belgefilmê li ser cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo kiriye û got, "Armanca me vejînkirina cihên dîrokî li bajarê Qamişlo ye."R-7

## 'Divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekbûyîna pêkhateyan ava bibin'



Sekretêrê Partiya Demokratî Kurd li Sûriyê (Partî) Nesredîn Ibrahîm da zanîn ku Konferansa Pêkhateyan gavek pratîkî, ji bo hevnêzîkirina nêrînan, xurtkirina baweriya hevbeş bi rêya diyaloga rasterast û naskirina maf û erkên hevbeş bû û got, "Divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekgirtina pêkhateyên tevahiya Sûriyê ava bibin."R-5



**Sûriyeya HTŞ'ê di bin dagirkeriyê de ye!**
Dilyar Cizîrî R-4



**Dagirkirina Hiş**
Farûk Sakik R-5



**Fermandar Nûreddîn Sofî...**
Zekî Bedran R-5



**Desteya hevbaş a rewşenbîran... gavek li pêş çar gav li paş**
Kemal Necim R-7

# ‘Armanc bihêzkirina jin di aliyê perwerde û aborî de ye’

Weqfa Jina Azad a Sûriyê ji 2014'an ve hatiye avakirin û di pêşxistina jinan de xwedî misyoneke bi heybet e. Rêvebera Projeyên Weqfa Jina Azad Viyan Elî da zanîn ku xebat û projeyên wan li ser bingeha bihêzkirina aliyê perwerde û aboriya jin tên meşandin.

**Esma Mistefa/Qamişlo**



Yek ji destkeftiyên ku Şoreşa Jin di Rojavayê Kurdistanê de avakiriye, pêşxistina jin di hemû aliyên jiyan û civakê de ye. Weqfa Jina Azad a Sûriyê di gihandina vê mîrasê de xwedî roleke diyarker bû. Têkildarî xebata ku ji aliyê wan ve hatine meşandin, Rêvebera Projeyên Weqfa Jina Azad a Sûriyê Viyan Elî bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Waqfa Jina Azad kengî hat avakirin, sîstema wê çawa ye û we çima pêwîstî dît ku avabikin?**

Weqfa Jina Azad di sala 2014'an bi deh jinan hat avakirin û dest bi kar kir. Ev xebat ne girêdayî tu aliya ye, weke xebateke serbixwe di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de bi armanca pêşxistina jin di hemû aliyan de, karê xwe dide meşandin. Ev xebata ku bi deh jinan hatiye destpêkirin, niha zêdetirî 150'î jinî cihê xwe tê de digre û bi sedan jin cihê xwe di proje û xebatên di nava civakê de têne kirin, digrin.

Weqfa Jina Azad xwe di asta hemû herêman de birêxistinkiriye, û di her herêmekê de navendeke fermî heye, her wiha di herêma Cizîrê de li her bajarekî navendeke me hatiye avakirin. Xebatê me bi awayê komîteyan tê meşandin komîteyên me jî ev in: Dîplomasî, Civakî, Tenduristî, Spor, Perwerde, Maliye û Komîteya Projeyan. Ev komîte di hemû herêman de hatine vekirin û li gor wê xebatê jin di hundir Waqfê de tê birêvebirin. Hêjayî gotinê ye ku hemû komîte ji xwe re perwerdeyên bîrdozî esas digrin û li gor wê kar tê meşandin. Mînak komîteya tenduristiyê li kêleka xebatên pratîkî perwerdeyên ji bo têgiştina jin di aliyê tenduristî de dide û li gor rojevê perwerde tên meşandin.

Pêwîstiya me bi avakirina vê xebatê bi taybet bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re gelek girîng bû. Jina di demên berê de her bi tirs û bê îrade nêz xwe dibû, diviyabû ev hişmendî êdî di asta yekemîn de ji serê jinê û ya din ji nava civakê bihatiba rakirin. Me didît ku jin di Sûriyê de çawa jiyan dikir û ji derveyî sînora malê tu mafekî wê yê rewa nîn bû. Li kêlek gelek tevger, sazî û aliyên ku bi jinê re mijûl dibûn, me jî xebateke bi vî rengî da destpêkirin da ku em bi hev re li ser yek armancê ku jin zincîrên hişmendiyên kevneşop yên ku ser hatine ferzkirin bişkîne û mafê jinê di civakê û tevahî cîhanê de misoger bibe.

**Xebatên ku hûn didin meşandin di kîjan çarçoveyê de ne, çiqas bandor kiriye û ji bo jin çiqas bûye cihê sûdweriyê?**

Me da zanîn ku di aliyê perwerdê de gelek xebatên berfireh di komîn, meclis û malbatan de tên meşandin. Hin ji xebatên me jî; cihê sporê yên taybet bi jin hene, navendeke me a xwedîderketina li zarokên sêwî li Kobanê heye, cihê çavdêriya zarokan (Hedanê) li hemû herêman hatine avakirin da ku jinên ku kar dikin bi rihetî derbasî nava karê xwe bibe, her wiha otomobêla me a gerok ya tenduristiyê heye, ev jî bi taybet li herêmên ser sînor digere, û di nava komîteya me a tenduristiyê de dayîna dermanan bê pere ye. Yek ji xalên girîng jî em giranî didin jin û jinên ciwan yên ku nikarên bixwînin, em hewil didin ji van jinan re bibin cihê alîkariyê û nefesek bin da ku rola xwe di nava civakê de bigrin û bibin xwediyê hêza xwe.

Yek ji xebatên herî girîng jî avakirina projeya ye. Pirojeyên me yên dirûnê, karê destan weke çêkirina sof, kuafêra ye her wiha pêşengehan vedikin. Di nava van projeyan de jin li gor xwestekên xwe di beşa ku dixwazin de tên perwerdekirin. Armanca me a yekemîn xurtkirina jin di aliyê perwerde û aborî de ye da ku jin bêyî ku destê xwe ji kesî re veke aboriya xwe pêşbixîne.

Di xala qebûlkirin û bandora vê xebatê li ser jin; Bi rêya xurtkirina xebatê me di nava civakî de em dibînin ku banoreke erênî li ser hemû jinan kiriye. Bi rêya Weqfa Jin, jin cihê xwe di nava xebatan de digrin, cihên xwe yên tayebet vedikin, di sazî û cihên ku pêwîstiya wan bi jin heye kar dikin. Ev hemû jî qebûlkirinekê dide avakirin her wiha dibe cihê sûdweriyê di aliyê birêvebirina malbat û civakê de.

**Proje û xebatên ku we di sala 2025'an de dane meşandin çi bûn?**

Li kêlek xebatên ku em dimeşînin de, di sala 2025'an de bi taybet xebatên gelek girêng di aliyê koçberan de hatin meşandin. Bi jin û zarokên ku mecbûr mane koçber bibin re, em gelek bûn alîkar. Her wiha di vê salê de me gelek kargehên dirûnê vekirin, bi taybet li Reqayê em amedekariya vekirina kargeheke mezin a jin dikin. û aktîvîstên ku ji bo zarokan me lidarxistin hene.

**Zehmetî û astengiyên li beramber we û jinan derdikevin çi ne? Gelo fikrandineke we heye ku di tavahî Sûriyê de ev xebat bê meşandin?**

Ez dikarim bêjim ku heyanî astekê zehmetiyên ku di destpêka avakirina Weqfê de derdiketin pêşberî me niha hatine rakirin. di dema ku ev xebat hatiye destpêkirin de me gelek astengî ji aliyê kişandina jin ber bi perwerdê û vegirtina wê di nava xebatê de didît. Tam ew asta ku niha hatiye avakirin wê demê nîn bû, ev jî tiştekî asayî ye, ji ber jinan maf û erkên xwe nasnedikir. Ê niha em dibînin ku jin bi xwe derbasî gel me dibin û dibêjin divê em perwerde bibînin. Helbet asta ku em niha gihiştinê xwe dispêre ked û hevgirtineke mezin a jinan.

Armanca me ne tenê em jinên di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de birêxistin bikine. Em dixwazin hemû jinên di Sûriyê de bibin xwedî hêz û îrade çi aliyê hişmendî û aborî de dibe. Lê belê ev yek jî li gorî rewşa ewlehî û siyasî a Sûriyê ye.

# Jin avakera zanistê ye

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Dîrok û zanist bi xwe civak e û her tiştê derbarê civakê de vedibêje, civak jî bêyî jinan ava nabe. Di vê demê de mirov dikare bêje ku jin di avakirina hişmendiya dîrok û zanistê de xwedî risteke bingehîn e.**

Di civaka xwezayî de jin pîroz di hat dîtin, ji ber ku ew avakerê dermanan û alavên cotkariyê bû. Di civaka xwezayî de ji ber pîrozbûn û girîngiya jinê bi navê “Jin-Dayîk” dihat bi navkirin. Ji civaka xwezayî de û heya roja me ya îro jin avaker û kedkar e. Lê bi derketina çanda desthilatdarî û baviksalariyê re hemû berhemên jinan ji wan hat standin û serdestî li ser jinana hat kirin. Jin ne koley e, dewltên desthilatdar ji bo desthilatdariya xwe îsbat bikin, berhemên jinan jê standin û desthihatdarî li ser jinan pêkanîn.

**‘Ji civaka xwezayî bigire dest haya roja me ya îro jin avaker û kedkar e’**

Dema ku mirov li dîroka mirovahî û civakê vegere, dê ji mirov re xuya bike ku jinan civak avakiriye û bi hezarê salan beriya niha civak bi rê ve biriye, zarok ji nifşekî derbasî nifşekî din kirine û civak serdem bi serdem, nifş bi nifş mezin û fireh kirine. Çi di milê xwedîkirina zarok û berpirsiyariya civakê de be û çi jî di milê avakirina derûniya civakê de be hemû xebat meşandine. Ev jî xuya dike ku jinan, di her gavên di pêvajoya civakê de xwe berpirsiyar dîtine û hewl dane ku rastiya her tiştî û her zanistê nas bikin.

Heger mirov li civaka xwezayî vegere dê ji mirov ve xuya û aşkere bibe ku jinan bi fedakirina giyana xwe hewl daye ku giyayên di xwezayê de ji bo zarokên xwe çêj bike, ka mirov dê pê bimire an na û piştre ji bo wan wek xwarinekê amade bike. Mirov dema li dîroka civaka kurd vegere dê bibîne ku jinan çand, ziman û wêjeya ku bi sedê salan di bin desthilatdariya dagirkeran de bû parastiye û ta roja me ya îro zindî kiriye. Ji ber ku jin dibistana civak û mirovahiyê ye ku zarokan bi rêya zar, ziman û wêjayê wan mezin dike.

**Jin û dîrok**

Dîrok çavkaniya hemû zanistan e, bi taybet di nava zanistên civakî de cihekî pir girîng digire. Dîrok ji bo mirov bîrgeh e. Pêdiviya mirov û civakê bi vê zanistê heye, li vir pirsek li cem me çêdibe. Gelo dîrok çawa ji nifşekî derbasî nifşekî din dibe?

Dîrok bi xwe civak e, her tiştê der barê civakê de vedibêje. Ji ber ku civak jî bêyî jinan ava nabin, di vê demê de mirov dikare bibêje jin di avakirina hişmendiya dîrokê de xwedî risteke bingehîn e. Zarok di destpêkê ji dayik û bapîrên xwe fêrî dîrokê dibin. Bi rengekî hunerî hişmendiya dîrokê derbasî hişê zarokan dibe. Çîrok, gotin, sembol, çand, wêje û ziman bi rêya jinan derbasî civakan dibin. Heger em qala dîroka devokî û wêjeyê bikin dê ji me re xuya bike azarên jinan di derbasbûna serdeman de, ku bi şikandina hestên jinan dîrok hatiye xemilandin û temam kirin.

**Jin û aborî**

Aborî ji bo pêdiviyên jiyanê, kar û barên der barê civakê de ye. Wateya wê birêvebirina debara civekê ye. Di ked û debara malê de keda sereke ji hêla jinan ve tê dayîn. Kedkarên bingehîn ên aboriyê jin in. Jinan di milê aboriyê de gelek kar û xebat kirine, weke: kedîkirina lawiran, cotkarî û çandinî, tevnandin, rêsandin û hwd. Bi yekê jî pênaseya aboriyê di roja me ya îro de hatiye guhertin. Di dema civaka wekhev û li gel hev de civak û aborî cihek bûn, lê di roja me ya îro de ji hev du hatine dûrxistin û li ser bingeha keda jinan kedkar û avakirina wê ya ji aboriyê re bazirgantî û kargehên kar û bazirganiyê ava bûne.

**Jin û tenduristî**

Jinan di dîrokê de hewl daye ku ji xwezayê derman û rêbazên başkirina tenduristiyê de, hewl daye ku xwezayê têxe xizmeta tenduristiyê û bi pêş bixe, çi ji şînatiyan bigire dest û çi jî ji lawiran sûdên bijîşkiyê, bigire. Bingeha zanista tenduristiyê



bi zanyarî û serboriyên jinan hatiye afirandin.

**Jin û demografî**

Demografî ji aliyê wateyê ve zanista hejmara şêniyan e û şêniyên dever û cihekî lêkolîn dike. Heger ku em anîna zarokan bigirin dest hebûna jinan bibandor e, ji ber ku jin zarokan tîne û dikare demografiyê biguhere, lê di dema me ya îro de mafê jinan hatiye xwarin û nifûsa zarokan di destê mêr deye û bi derketina dewlet û desthilatdariyê re mêr avaker e ji demografiyê re û ev hişmendî li hemû cîhanê bibandor e.

Di encamê de hemû zanistên civakî bi rêya jinan hatine bipêşxistin û avakirin û jin di wan de roleke sereke dilîzin. Lê di çanda desthilatdarî û dewletan de ev tişt veşartî ye û li berovajî wê mafê jinan hatiye bikaranîn. Di avakirina dewlet û desthilatdaran de jin weke amûreke ku di civekê de tê bikaranîn û tu girîngiya xwe tune ye. Di serweriya mêr de û bi derketina baviksalarî û zayendperestiyê de jinan tu girîngiya xwe di civakê de tune ye, nikare tu rolê bilîze, karkera malê ye û mêr wê wek makîna zarokan û karkera malê dibîne. Lê heger ku em li zanistê vegerin û baş lê mêze bikin dê ji me re xuya bike ku jin a ku zarokan tîne û dema ku ji dayîkbûna zarokan de, zarok jî bi civaka ku jinan ava kiriye mezin dibe. Heger em çiqasî keda jinan û li hemberî wê ked û azarên jinan vebêjin têrê nake lê bi gotineke balkêş, jin ew e ku zarokan bi rêya hestên xwe dilorîne û ew landika civakê ye.



# ‘Armanca me vejînkirina cihên dîrokî li Qamişlo ye’

Endamê Navenda Pargîn a Lêkolîn û Parastina Kevneşopan Cemîl Ehmed diyar kir ku 6 meh in wan dest bi amedekariyên belgefilmê li ser cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo kiriye û got, “Armanca me vejînkirina cihên dîrokî li bajarê Qamişlo ye."

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Navenda Pargîn a lêkolîn û parastina kevneşopan ev şeş mehin dest bi amedekariya belgefilmekî li ser cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo kiriye. Armanc ji vî belgefilmî vejînkirina cihên dîrokî li bajarê Qamişlo ye û belgefilm niha di qonaxa xwe ya dîmenkêşiyê de ye. Pargîn gotineke koçeran e û tê wateya ‘kolana li dora kon’. Ev kolan parastina ji baran û dirindeyan dike. Ji bo parastin û lêkolîna çanda gelêrî ev nav li saziyê hatiye kirin.

Di debarê amedekariyên belgefilmê de, endamê Navenda Pargîn a Lêkolîn û Parastina Kevneşopan Cemîl Ehmed ji Rojnemya me re axivî.

**‘Em girîngiyê didin cihên kevneşop yên civakê’**

Cemîl Ehmed da zanîn ku ev şeş mehin wan dest bi amedekariya belgefilmê li ser cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo kiriye û wiha got: “Armanca me ji belgefilmê li ser cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo, vejînkirina cihên dîrokî li Qamişlo ye. Li gorî ku me nîqaş dikir, pêwîst bû ku pargîn ji vî awayî hîn bêtir berfertir ba, lê ji ber rewşa heyî me nikarî pargîn berferh bikin. Lê ruxmî van astengiyan ez û mamoste Abdîn yê ku alîkariya min di dîmenkîşadina belgefilmê de kiriye, me karîbû heta astekê belgefilim bi aweyekî serkeftî birêve bibin. Navenda Pargîn girîngiyê dide cihên kevneşop yên civakê û bi taybet amûrên ku bi destê jinê hatine çêkirin weke Tenûr, genim û hwd.. li bajarê Qamişlo heta niha li gelek cihan tenûr tê bikaranîn. Herwiha belgefilma ku li ser bajarê Qamişlo tê çêkirin di destpêka wê de sînaryo hat nivîsandin û cihê ku dîmen jê werin kişnadin hatin diyarkirin. Ew cih jî taxên herî kevnarin ku lê tiştên dîrokî lê tên dîtin, di heman demê de ev cihên dîrokî yên li bajarê Qamişlo di bin kontirola saziyên ewlehiyê de ne. Ji ber vê yekê me destpêkê destûr ji wan saziyan xwest, da ku em bi hêsanî dîmenên xwe bikşînin.”

**‘Em dixwazin bi aweyekî rasterast dîroka bajarê Qamişlo bighînin civakê’**

Ehmed anî ziman ku di bajarê Qamişlo de cihên herî kevnar mîna wargeha leşkeran û zindana reş in û wiha pê de çû: “ Ji ber ku ev her du binesazî avahiyên destpêkê yên bajarê Qamişlo ne, ji ber ku Qamişlo cihekî sitrajîtîke xwestin ku van cihên girîng lê avabikin. Herwiha bi dehan gundên bajarê Qamişlo berî hezarên salan hatibûn avakirin û cihên dîrokî lê tên dîtin. Lewma me xwest ku kesên bi temen mezin ku şopeke wan di dîroka wî cihî de heye derbasî belgefilmê bikin. Lê heger ev kes jî nehazir bin em dikarin ji zarokan wan biprsin û çîrokên ku bav û dayîkan ji wan re digotin, ji bo me bînin ziman. Ne tenê em belgefilmê bi netewekî re çêdikin, belê hemû netewên ku li Qamişlo dijîn bi wan re reportaj tên çêkirin. Gelek kes berî me belgefilmên cuda li ser bajarê Qamişlo çêkirine, lê ew belgefilm li ser bingeha bazrganiyê



hatibûn çêkirin. Lê em weke navenda Pargîn armanca me ne bazrganiyeke, lê belê em dixwazin bi aweyekî rasterast dîroka Qamişlo bigihînin civakê.”

**‘Ez bi hêvî me belgefilm bi awayekî zengîn were pêşkêşkirin’**

Endamê Navenda Pargîn a Lêkolîn û Parastina Kevneşopan Cemîl Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir:” Daxwaza me belgekirina her amûrekî kevneşop û dîrokî li bajarê Qamişlo ye, wê her dem karê Pargîn berdewam be. Herwiha di demên pêş de wê li ser gelek cihên dîrokî belgefilm werin çêkirin. Hêviya min ew e ku belgefilma Qamişlo bi aweyekî zengîn were pêşkêşkirin, her kesê ku pirsa wan li ser dîroka Qamişlo heye di vî belgefilmî de bersiva xwe bibîn e.”

# ‘Muzîk çeka derûnî û çavkaniya coşê ye’

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Hunermendê Kurd Resûl Diljar ji 9 saliya xwe ve dest bi karê muzîkê kiriye û ew di malbateke ku ji muzîkê hez dike mezin bûye. Herwiha Resûl Diljar diyar kir ku muzîk ji bo wî çeka derûnî û coşê ye.**

Hunera Kurdî ya dewlemend bi dengbêjî û stranbêjiyê bi sedan salan hatiye parastin û di bîra civakê de maye. Her gel bi çand û hunera xwe tê nasîn, mirovên ku hunera wan tunebe nasnameya wan jî tune ye. Gelê Kurd jî bi hunera xwe tê nasîn, her hunermendekê, stranbêjek û tembûrvanek bi stranan parastina hunera Kurdî dike û dihêle ku zindî bimîne. Lewma di parastina çand, huner û nirxê gelê kurd de hunermend, tembûrvan û stranbêjên ciwan ên Kurd rolek mezin lîstin e. Ciwanên kurd ji bo parastina mîrata çandî ya kurdî kedeke mezin dane. Di heman demê de, li Rojavayê Kurdistanê bi Hunermendên xwe yên ciwan dewlemend e, û bi taybet jin, zarok û ciwan, yek ji wan hunermedê ciwan Resûl Diljar e.

**Kurte jiyana Hunermend Resûl Diljar**



Hunermedê Kurd Resûl Diljar di sala 2002'an de ji bajarê Qamişlo ji dayîk bûye, ew di malbateke ku ji muzîkê hez dike mezin bûye. Resûl Diljar ji 9 saliya xwe ve dest bi karê muzîkê kiriye û di malbatê de dayîka wî piştgirî dayê ku tevlî qada muzîkê bibe.

Di derbarê jiyana xwe ya hunerî de, hunermedê Kurd Resûl Diljar ji Rojnameya me re axivî.

**‘Muzîk xwarina giyanê mirov e ’**

Resûl Diljar anî ziman ku muzîk ji bo wî çeka derûnî û coşê ye û wiha got: “ Muzîk ji bo min çeka derûnî û kêfxweşiyê ye, herwiha muzîk weke xwarina giyanê mirov e . Çawa ku mirov nikare bê xwarin jiyan bike, ez jî nikarim bê muzîk jiyan bikim. Di destpêkê de min gelek astengî û zehmetî dîtin, ji ber ku ez di peyîmangeha muzîkê ya girêdayî partiya Netewî de nehatim qebûlkirin. Piştî demekê, yek ji navendên Rêveberiya Xweser a Demokratîk alîkarî bi min re kir. Di heman demê de, ez tevlî Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bûm û heta niha di nava qada leşkerî de cihê xwe digirim. Ez zehmetiyê di karê xwe de dikşînim, lê bê ku ez cudahiyê bikim navbera erka xwe ya parastina gel û muzîkê de kar û xebatê xwe dikin.”


**‘Muzîk aramiyê bi xwe re ava dike ’**

Resûl Diljar eşker kir ku muzîk aramiya canê mirov e, û wiha berdewam kir: “Min xwe bi xwe pêşxist ji bo fêrkirina amûrên têlî. Piştî derbasbûna çend salan min du stran nivîsandin, yek li ser ruhê hevaltiya şehîdan ya din jî li ser hezkirina di navbera cîranan de bû. Ez niha li ser nivîsandina stranên nû kar dikim ku mîrate û hezkirina Kurdî îfade dike. Ez bang li hemû ciwanan dikin ku berê xwe bidin fêrkirin û naskirina her tiştî, herwiha dûrî aliyê nebaş ji jiyanê bikevin.”

**‘Muzîk asoyên mirovan kûrtir dike’**

Hunermedê Kurd Resûl Diljar axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Her mirovek bi rengekî cuda ji muzîkê hez dike, herwiha huner parçeyek ji jiyana mirovan e, dengê muzîkê yek ji wan dengan e ku mirovan dixe nava aramiyeke bê sînor de. Her kes di jiyana xwe de rastî astengiyan tê, helbet astengî di jiyana min de jî derbas bûne. Pêwîst e kesê ku xwedî xeyal, dev ji xeyalên xwe bernedin û çiqasî rastî astengiyan jî werin pêwîst e riya xwe berdewam bikin, ji ber ku her tişt bi israrê pêk tê. Ez bi hêvî me ku muzîk alîkar be ji bo vî welatî û bi taybet tembûr, ji ber ku Tembûr çanda kurdî ye, herwiha em weke nifşê nû yê civakê, bi stran û hunera xwe, çanda û civaka xwe ya kevnar diparêzin. Divê her ciwan tirsa di hundirê xwe de derbas bike û li hunera kurdî xwedî derkeve, herwiha pêwîst e ciwan girêdayî çand xwe bin û xwedî lê derkevin, ji bona ku çanda me were parastin û winda nebe.”

## Têbînî



### Desteya hevbaş a rewşenbîran… gavek li pêş çar gav li paş

**Kemal Necim**

Berî çend salan li Rojavayê Kurdistanê di qada rewşenbîrî de tevgereke ji bo yekirina yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran pêk hat. Serkêşiya vê tevgerê Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê kir. Lê mixabin ev hewldan bi encam nebûn. Em li vir behsa girîngî û armancên yekirina qada rewşenbîrî nakin, her wiha em behsa sedemên ku ev hewldan têk çûn jî nakin, ji ber ev tişt hemû diyar û naskirî ne.

Di sala dawî de û piştî hilweşîna rejîma Baas`ê û guherînên ku li welêt bi giştî çêbûn, mijara yekrêzî û yekhelwestiya tevgera siyasî ya Kurdî li Rojava kete rojevê. Weke hewldaneke piştgiriya vê helwestê dîse hewldanên HRRK`ê yên yekirina qada rewşenbîrî dest pêk kir. Di encama hin xebat û hevdîtinan de roja 7`ê Adaara 2025`an li bajarê Qamişlo Dîdara Giştî ya Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê kurdistanê hat lidarxistin, endam û nûnerên 5 yekîtiyên nivîskar û rewşenbîran tevlî dîdarê bûn. Lê dîsa encama sereke ya dîdarê pêk nehat. Wek berdewama dîdarê, roja 18`ê Adarê dîse nûnerên 5 yekîtiyan civiyan û biryar dan ku ji bo kar û xebatên hevbeş “Desteya Hevbeş a Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê” damezrînin. Armanca sereke ya desteyê lidarxistina çalakiyên rewşenbîrî yên hevbeş bû, ji bo wê jî plana xebateke hevbeş a ji 8 xalan hat danîn.

Her çiqas damezrandina vê desteyê wekî reva ber bi pêş ve bû, lê dîse jî weke ku bi kurmancî tê gotin “ji tuneyî baştir e”. Lê li ser erdê çi bû û çi nebû?

Deste ji 10 endaman pêk tê, ji her yekîtiyekê du endam. Lê li şûna ku ev deste hewl bide bibe sîwaneke giştî ya hemû rewşenbîrên Rojava li şûna ku bibe egera pêşxistin û bedewkirina dîmena rewşenbîrî, li şûna ku projeyên çandî û wêjeyî yên bi bandor pêş bixe, li şûna van hemûyan sûrek li dora xwe ava kirin, dîwarek di navbera xwe û rewşenbîran de danîn û bi navê desteyê biryar û vîna rewşenbîran xistin bin destê xwe. Ji xwe re logoyek çêkirin, ketin pey hewldana ku xwe weke saziyeke cuda fermî bikin û destûrê bistînin û navendekê vekin. Li aliyekî din jî xwe ji qada rewşenbîrî dan aliyekî, xebatên çandî ji bîr kirin û ketin pey serdanên navendê partiyên siyasî. Bê plan, bê proje ketin pey serdana serkirdeyên siyasî û leşkerî yên rêveberiyê û her wiha xwestin bi navê desteyê li derveyî Rojava jî serdanên siyasî bikin.

Ev serdan û tevgera bêserûber bi navê rewşenbîrên Rojava tê kirin, lê hayê yek rewşenbîran jî jê tune ye, ne jî nêrîna wan hatiye guhdarkirin. Ji ber ev reftar û tevgera bêserûber bê plan û proje bû, wiha xuyaye ku tenê armanca wê, wenîşandan û kişandina çend wêneyan bi hin rayedarên siyasî û leşkerî re ye û ti têkilya wê bi reftar û tevger û xebata rewşenbîrî re tune ye. Eger rewş wiha dewam bike, dê ev deste li şûna ku bibe sîwana rewşenbîran û bibe egera yekkirina tevgera rewşenbîrî, dê ew jî bibe saziyek û li şûna 5 yekîtiyan dê 6 yekîtî çêbibin.

Desteya Hevbeş a Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Rojavayê Kurdistanê eger ji reftarên xwe yên bêserûber venegere û dîse nekeve ser rêya xebat û çalakiya rewşenbîrî ya rasteqîn, baştir e ku were hilweşandin.

# Pirsgirêkên xizmetguzarî û sedemên wê li Qamişlo

Li Qamişlo ji ber pirsgirêkên xizmetguzariyê yên mîna kêmbûna elektirîk, av û qalîteya nan welatiyên bajêr tengaz dibin. Di vê çarçoveyê de berpirsên saziyên xizmetguzariyê diyar kirin ku ew hewil didin li gorî derfetên heyî pirsgirêkan çareser bikin.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Elektirîk, nanpêjî û av ji bingehên berdewamiya jiyana mirovan e, lê bi dirêjahiya demê re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê astengî û pirsgirêk di van hêlan de tên derxistin. Herwiha bingehê nanpêjî û avê elektirîk e. Lê şêniyên Qamişlo hin deman van pirsgirêkan jiyan dikin, bi taybet pirsgirêka qûtkirina elektirîkê ji demeke dirêj ve ku bandor li gelek tiştên din jî kiriye. Herwiha li herêmê bi giştî ji ber kêmbûna avê aloziyeke mezin tê jiyankirin, bandorê ne tenê li ser tîbûnê kiriye, lê li ser paqijbûn û tenduristiya giştî jî dike. Di heman demê de pirsgirêkên nanpêjan hene ku gel gazinan ji nexweşbûna nan dikin. Lewma di nava rapora xwe de em ê balê bikşînin ser van mijaran.

Di vê çarçoveyê de, hevserokê Navenda Elektirîkê ya bajarê Qamişlo û gundewarên wê Fayiq Ehmed, berpirsê Ava bajarê Qamişlo Mehmûd Mehmûd û Hevserokê Komîta Nanpêjan ê Kantona Cizîrê ya girêdayî Mecilsa Desteya Aborî û Çandiniyê ya Kantona Cizîrê Rondar Salih ji Rojnameya me re axivîn.

Hevserokê navenda elektirîka Qamişlo Fayiq Ehmed diyar kir ku bi hilweşandina rêjîma Baasê çavkaniyên elektirêkê li Qamişlo hatin sererastkirin, lê ji ber kêmbûna rêjeya avê pirsgirêka qûtkirina elektirîkê berdewame û wiha got: "Piştî êrişa dewleta Tirk a dagirker li ser hemû binesaziya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku di nav de jî navendên sereke yên belavkirina elektirîkê û çavkaniya wê ya sereke stasyona Siwêdiyê bibû armac, ev çavkanî hatin rûxandina. Girêdayî wê stasyonên elektirêkê li bajêr belav dikin jî bibûn aramc, lewma stasyon ji xizmetê derketin û ev yek bandor li ser Qamişlo û herêmê giştî kir. Ev pirsgirêk salekê bêtir dewam kir. Lê piştî rûxandina rêjîma Baas navendên elektirîkê jinûve hatin sererastkirin, lê gelek ziyan lê hatibûn kirin, hem jî salekê li derveyî xizmetê bû, lê me hewl da ku elektirîkê bidin bajêr û gundewarên wê. Ji bo wê di meha Çile, Sibat û Adarê de ji seatekê heya 2 seatan elektirîk li ser gel dihat belavkirin.

Lê îsal demsala zivistanî baran gelek kêm bû û bandora wê li ser herêmê giştî kir, aliyekî din jî dewleta Tirk peymanên girêdayî avê yên



Fayiq Ehmed

ku bi rêjîma Sûriyê re kiribû, her tim binpêkiriye û avê li ser herêmê qût kiriye. Ji bo wê destpêkê di meha Berfanbara 2024'an û şûn de, elektirîk nêzî 80 Mêga ji me re dihat. Sedemê wê kêmbûna avê ye ku rêjeya ava Firatê daket 60 piştî wê dîsa daket 45'an, wê demê me wek tedbîr girtin, ew jî li gorî sîstema Bendava Firatê ya ku çavkaniya elektirîkê ye. Lewra em bêçar bûn ku elektirêkê bi giştî li ser xetên bajêr qût bikin ev jî di meha Nîsanê de bû. Tenê ji bo gundewarên Qamişlo ku jenetorên wan tune, derdorî 2 seatan elektirîk li ser wan tê belavkirin ji bo peydakirina ava vexwarinê. Ji ber bajêr bi rêya jenetoran dikarin ava xwe bişkşînin."

### 'Bandora kêmbûna ava Firatê li ser elektirîkê heye'

Fayiq Ehmed da zanîn ku her diçe ava Bendava Firatê kêmtir dibe û wiha pê de çû: "Her diçe av di bendavê de kêm dibe, elektirîk jî pêre kêm dibe ku rojane nêzî 6 seatan elektirîk dihat qûtkirin, piştre bû 12 seat û tenê 8 seat dihat ew jî ji bo navendên xizmetguzarî yên ku di nav bajarê Qamişlo de mîna nexweşxane, nanpêj, cihê sereke yên bîrên avê û hwd… Ev pirsgirêk berdewame ji ber kêmbûna elektirîka ku ji me re ji Bendava Firatê tê ku ev herêm bi rêya xetekî 230 kîlo volt de û tenê ev xete. Hin caran pirsgirêkê din jî derdikevin mîna bahozên ku çêdibin, dibe sedema ku birc bikevin û ew dem dixwe heya tên sererastkirin, ev jî dibe barek li ser gelê me yê ku di Qamişlo û gundewarê wê de jiyan dike."

### 'Altirnatîfên peydakirina elektirîkê tune ne'

Fayiq axaftina xwe wiha qedand: "Herêma me herêmekî dorpêçkirî ye heya niha, ji bo wê ew alavên teknîkî ji bo elektirîkê çêbikin, derbas nabin. Elektirîk jî sedemekî bingehîne ji bo ewlebûn di herêmê de were çêkirin, lê mixabin heya niha me tu altirnatîf peyda nekirine ku bikaribin elektirîkê belav bikin, rewş jî bi vî rengî dewam dike."



Mehmûd Mehmûd

### 'Hişksalî bandor li ser kêmbûna avê kiriye'

Berpirsê ava Qamişlo Mehmûd Mehmûd diyar kir ku gelek sedemên pirsgirêkên avê hene û wiha got: "Pirsgirêkên avê yên ku di dema dawiyê de derketin gelek sedemên wê hene, lê sedema bingehîn qûtkirina elektirîkê li ser stasyonên avê û bîrên rojhilatê Qamişlo ye. Cara yekê ku elektirîk li ser stasyonên avê tê qûtkirin, destpêkê 6 seat bû, piştre bûn 12 seat, niha jî daketiye 3 seatan ku elektirîk li ser stasyonên avê qût dibe. Sedema din kêmbûna avê yê, ji ber hişksaliya ku li herêmê rû da baran nebariya û bîrên me yên binerdê xwesipartina wê li ser baranê ye. Kêmbûna baranê hişt rêjeya avê jî dakeve, berê rêjeya avê 170 û 180'ê zexta hîdrodînamîk, niha zexta hîdrodînamîkî daketiye 200 m ev cara yekem jî dadikeve vê rêjeyê, ji ber hişksalî çêbûye. Di heman demê de hişksalî û kêmbûna baranê hiştiye bîrên sererdê zuwa bibin. Kesên ku ava wan tunebû ji bîrên xwe sûd digiritin, lê niha av di wan bîran de nemaye, ev jî sedemeke ku pirsgirêkê avê derkeve. Sedemên din jî hene ji ber sîstema toran ne zincîrî ye ku pompekirin nayê kontirolkirin, lewma cih hene av tê cih hene nayê. Herwiha pirsgirêk li 3 cihan çêdibe, li cihê bilind wek Kornîş, li dawiya torê û cihê dûr."

Mehmûd hejmara bîrên li Qamişlo eşekere kir û wiha domand: "Hejmara bîran li stasyona Hilêliyê 52 bîrin, Ceqceq 6 bîr, Uwêca 10 bîr û aliyên rojhilat jî 13 bîrin. Hejmara bîran bigiştî 81 bîrin, stasyona Hilêliyê rojê 35 hezar m3 pempe dike, Ceqceq 3 hezar û 500 m3, Uwêca nêzî 2 hezar m3, bîrên rojhilat jî di navbera 4 heya 6 hezaran m3 pempe dike û ev av belavî aliyên rojava û rojhilat dibe. Pirsgirêkên avê yên rojavayê Qamişlo ji yên rojhilatê wê bêtirin, ji ber bîrên rojhilat di nava taxan de belavkirî ne û bi berdewamî avê dide wan taxan. Lê taxên rojava şêneyên wê bêtirin ku ji sedî 60 xelekên Qamişlo li aliyên rojava ne û 40 li aliyê rojhilatin."



Rondar Salih

### Pirbûna şêneyan û kêmbûna avê

Mehmûd axaftina xwe wiha bidawî kir: "Ev nêzî 20 salan tu pêşketin neket zêdebûna avê de, lê xelêkên Qamişlo zêde dibin, bajar mezin bûye, avahiyên bilind çêbûne, li beramberî wê rêjeya avê wek xwe me. îsal Rêveberiya Xweser erêkirina 20 bîran dan, 12 bîr jê ji stasyona Hilêliyê ye ku xezaratê her bîrekê di seatê de 75 m3 be, 6 bîr jî li taxa Cûdî wê bên kolandin ew jî wê bixezîne stasyona Uwêca û 2 bîr li Ceqceq. 6 bîr niha li Hilêliyê hatin kolandin û 6 mane, piştî ev bidawî bibin yên kolandina yên din bê destpêkirin, bi van wê rêjeya avê li bajêr zêde bibe."

### '17 nanpêjên giştî li Kantona Cizîrê hene'

Hevserokê Komîta Nanpêjan Rondar Salih diyar kir ku da zanîn ku 17 nanpêjên giştî li Kantona Cizîrê hene û wiha got: "Li Kantona Cizîrê 17 nanpêjên girêdayî Rêveberiya Xweser hene. Nanpêjên taybet ên pêjiyanî jî 177 û yên kevir ê pêjiyanî yên taybet 76 in, ev jî girêdayî me ne, ev hejmarê nanpêjan bigiştî li kantonê ne. Ji van nanpêjan re rojane rêjeyek hevîr nêzî 520 ton tê bevalkirin. Ev mîqdar hate destnîşankirin piştî ku serjmarî ji hemû bajaran re hate çêkirin. Nanpêj ji aliyên mateyalên pêwîst tê piştgirîkirin wekî hevîr, sotemenî, xemîr, xwê û tûr. Buhaya nan jî 3 hezar lêreyên Sûrî ye. Beşên komîteya me yên bi nanpêjan re mijûl dibin hene wekî beşê hesabdarê materyalan, fenî, şopandina nanpêj, aş û depoyan, girêdana me û van beşan bi hev re heye, da ku em nanpêjên xwe bişopînin û wan dîspilîn bikin.

Li gorî hevpeymana civakî ya nû jî niha Meclisên Aborî û Çandinî li her bajarekî tê çêkirin û heye niha li 5 bajaran Dêrik, Tirbêspiyê, Qamişlo, Dirbêsiyê û Hesekê hatine çêkirin, di wan meclisan de komîteyên nanpêjan hene. Bajarên ku hîna meclisên wan nehatine avakirin jî, têkiliya me bi komîteyên aborî re heye, hemahengî jî bi rojane tê kirin. Herwiha di seat 3 êvarê de em dest bi şopandinên xwe dikin, ji ber di 3'ê êvarê de nanpêjên taybet dest pê dikin."

### 'Raporên komînan bingehin'

Rondar diyar kir ku taybetmendiyên wan ji bo nan hene û wiha bilêv kir: "Dema kêmasî di nanpêjê de bê derxistin, tê hişyarîkirin, heger bê dûbarekirin ew tê cezakirin, carnan hin nanpêj tên girtin û carnan destûra nanpêjê ji xwediyê wê tê birin, ev jî li ser hin nanpêjan pêk hatine. Cezayên me jî ji bo kesên ku bi nanê gel bilîze girane, ji ber taybetmendiyên me hene ji bo nan wekî giraniya nan kîlok û 100 xiram, her kîsek jî 9 nan ne û qetrê nan jî 30'î santî m be. Raporên komîn û gel ji me re bingehin komîn dikare bêje em nanê vê nanpêjê naxwazin an dixwazin.

Di dema dawî de gazinên gel pir li ser nan hatin, ji bo wê şopandinên me hîn zêdetir bûn, heya astekê ev yek hate çareserkirin. Dema nanê me nebaş be, em ji gel re radighînin û sedemên wê jî diyar dikin. Gelek gazinên nanpêjan li ser depoyan hevîr hebûn, ji bo wê me biryar da ku dema hevîr ji nanpêjan re bê û ne li gorî tê xwestin be, ji mafê wî ye hevîrî negirin. Ya din hin nanpêj hatin hişyarîkirin û kesên gûhnadina karê xwe neke tên rawestandin. Gerima niha jî bandora wê li ser nan heye, ji ber nan ji nanpêjê baş derdikeve, lê heya tê belavkirin pirsgirêk derdikeve, ji bo wê em dengê xwe dighînin gel jî dema nan bê belavkirin nanê xwe di dema xwe de bigirin. Herwiha rojan jî alavên nanpêjan tê lênerînkirin, armac jê jî pêşxistin û başkirina kare."

Rondar axaftina xwe wiha qedand: "Li Qamişlo piştî hilweşandin rêjîmê 3 nanpêjên din ketin destê me de ku berê tenê yek bû, ev jî ji bo Qamişlo û gundên hewîrdorê re ne. ji derveyî van 50 nanpêjên pêjiyanî yên taybet ên me hene. Herwiha ji bilî komînê kes nikare nan belav bike. Hêviya min ew e ku gel bi me re alîkar be, şopandina wan jî hebe û çi cihê lê pirsgirêkê bibînin bi me re pêwendiyê bikin, em jî pêşwaziya her kesî dikin."



# 'Çareseriya hemû pirsgirêkan pêkanîna demokrasiyê ye'

Nûnerê Partiya Yêkîtiya Demokratîk PYD'ê li Iskendenafyayê Dara Ehmed diyar kir di dîrokê de pirsgirêka herî mezin di Rojhilatê Navîn de, pirsgirêka gelê Kurd e û wiha got: "Çareseriya pirsgirêka gelê Kurd û hemû pirsgirêkan, bi pêkanîna demokrasiyê pêkan e."

**Aryan Hesen/Qamişlo**

Di sedsala bûrî de, li Rojhilata Navîn di navbrera hêzên desthilatdar de gelek peyman hatine imzekirin, bi van peymanan xwestin gelên Rojhilata Navîn ji maf û nasnameya wan pêpar bihêlin. Gelê herî zêde ku ziyan dît û ji tevahî mafê xwe hat bêpar kirin, gelê Kurd bû. Li hemberî wê jî gelê Kurd dest bi têkoşînê kir û qurbaniyên mezin dan.
Di vê çarçoveyê de Nûnerê Partiya Yêkîtiya Demokratîk PYD'ê li Iskendenafyayê Dara Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

### 'Dozekî navendî çar dewletan digire nava xwe'

Dara Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Weke dozekî navendî çar dewletan herêmê; Sûriyê, Îraq, Tirkiye û Îran digre nava xwe, çareseriya vê pirsgirêkê girêdayî pêkanîna demokrasiyê di Rojhilatê Navîn de ye, bi taybet di van dewletên ku Kurdistanê dagir dikin, lêgerîna çareseriyê nehatiye kirin û pirsgirêkê dewam kiriye. Ev yek bi têkiliyên hêzên herêmî û hêzên navneteweyî dewam kiriye. Di sedsala bûrî de gelek peyman di Rojhilata Navîn de hatine imzekirin wekî; Saykispîko, Lozan û Sêrvirê. Van peyaman bandorek mezin a neyînî li ser tevahî cîhanê kir û bi taybet li ser gelê Kurd. Pirsgirêka gelê Kurd derket pêş û hewaldanên çareseriyê nehatin kirin. Li beramberî vê yekê gelek serhildan, raperîn û şoreşên Kurdan hatin lidarxistin. Gelê kurd nerazîbûna xwe li hemberî van peymanan û li hemberî zordariya van dewletên dagirker nîşan dan. Li ser vê bingehê şoreşa gelê Kurd ku bi pêşengtiya Rêber Apo û PKK'ê bû. PKK'ê wekî tevgereke şoreşgerî, civakî, netewî û enternasiyonal hat damezrandin. Ew bû hêza çareseriya pirsgirêka Kurd û di nav de pirsgirêkên netewên din yên li herêmê jî, di heman demê de bû hêza çareseriya pirsgirêka xwezaya sîstemên dektator, nejadperest û şofînî yên di Rojhilata Navîn de desthilatdarin. Wekî sîstema Baas li Sûriyê. Rêber Apo û PKK'ê paradîgma û projeyên çareseriyê dane nîşandan, li ser vî esasî têkoşîneke bêhempa û birumet dane meşandin. PKK'ê piştî biryara xwe ji nûve avakirinê û merasîma şewitandina çekan bû rêya çareseriyê û aştiyê."

### 'Rêber Apo sazkarê paradîgma azadî û aştiyê ye'

Ehmed diyar kir ku pêvajoya Rojhilata Navîn a nû weke siloganekê xwaş tê dîtin, lê wek naverok ji aliyê kê ve hatiye lidarxistin? kî dixwaze wê saz bike? û wiha domand: "Tê naskirin ku Rojhilata Navîn ji aliyê hêzên hegemonîk ve tê birêvebirin, li beramberî wê Rêber Apo û PKK'ê pêvajoya Rojhilata Navîn a demokratîk ku hemû pêkhateyên herêmê bi aştî bi hevre bijîn dan pêş. Beramberî wê jî hêzên herêmî hene ku îro di hundirê herêmê de ne û pirsgirêka kurd têkildarî bi wan ve girêdayî ye weke Tirkiyê û Îran. Ew pêvajoya di hundirê Îraqê de hatiye rûdan û herêmekê Kurd a fîderal hatiye avakirin. Sûriyê derbasî rewşeke nû bûye, bi taybet piştî 14 salan ji şerê navxweyî û hilweşandina rejîma Baas guhertinên mezin pêk hatin. Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiyek Xweser hatiye avakirin, hemû pêkhate di wê herêmê de bi rengekî aştî, demokratîk û komînal di bin silogana netewa demokratîk de jiyan dikin. Netewa demokratîk eltirnatîfa sîstema yek netew weke li Tirkiyê her kesî Tirk dibîne, li Sûriyê di dema Bassê de her kes Ereb didîn, herwiha di Îranê de jî ew sîstem bû. Ji ber vê yekê di hundirê pêvajoya nû de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê projeya netewa demokratîk hat belavkirin ku hemû pêkhate di hundirê wê de rêveberiyeke xwe ya xweser ava bikin. Ev hêza nû hêza çareseriyê ye ku Rêber Apo pêşniyar kirî wek proje û peredîgma ku hemû pêkhateyan hembêz dike. Lê dewleta Tirk bi rengekî cûda nêz bû. Lê di dema dawî de pêşketin û guhertinên mezin di hundirê herêmê de çêbûn, bi taybet piştî şerê Xezayê û heya roja îro ew rûdana pêvajoya Rojhilata Navîn a nû ji aliyên hêzên herêmî ku girêdayî hêzên hegemonîkin, tê xwendin û li hemberî wê tedbîran dikin. Ev veguhertin jî wê dewletên herêmê jî bigire nava xwe bi taybet îran, Tirkiyê û di hundirê van dewletan de pir pêkhate wê hebin, ev veguhertin wê sîstema nexşeya dîmografî ya nû bidê, rewşa pêkhateyên wê cûda be, bi taybet gelê Kurd ji ber ku ew bûye hêzeke sereke di milê dîmografî, siyasî û îdolojî de û di heman demê de bûye hêza veguhertinê û hêzeke ku dikare di Rojhilata Navîn de dengeyan çêbike, li ser wî esasî dewleta veşartî, ev proje baş xwend û bi îradeya xwe xwest ku derbasî vê pêvajoyê bibe û bi Kurdan re bikeve dîyalogê. Rêber Apo ji bo vê gavê gelek erênî nêzîk bû, ev pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi nav kir, ev sê peyvin ku wateyên xwe yê pir kûr hene. Deshilatdatên ku di hundirê herêmê de tevahî û di nava wan de Tirkiye rê nadin ku civakeke demokratîk were avakirin, civaka Tirkiyê ji berî 100 salî ve li ser nijadperestiyê, ne qebûlkirinê, înkarê û ne razêbûnê hatine perwerdekirin."

### 'Hikumeta veguhêz a Şamê xîtaba kîn û nefretê balav dike, lê li beramberî wê Rêber Apo zemînê aştiyê da avakirin'

Nûnerê Partiya Yêkîtiya Demokratîk PYD'ê li Iskendenafyayê Dara Ehmed axaftian xwe wiha bi dawî kir : "Di dema niha de hikumeta veguhêz a Şamê xîtaba kîn û nefretê di nava civakê de belav dike. Lê li hemberî zihniyeta desthilatdarî, qirkirin û neqebûlkirinê, Rêber Apo û PKK'ê zemîneke ji aştî û civaka demokratîk re didin avakirin. Civakên ku bi sadê salan li ser esasê nijadperestiyê hatine avakirin pir zehmete ku li



ser esasê aştî û netewa demokratîk ji nû ve werin sazkirin, lê Rêber Apo bi fikrê xwe ev zemîn da pêş û mînaka wê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye ku hemû pêkhate li ser esasê biratiya gelan, azadî û wekheviyê jiyan dikin. Rêber Apo gelek gav avêtin û xwe da pêş, gava yekemîn jî kongra fesixkirina PKK'ê bû, PKK'ê danasîna nasnameya gelê Kurd e. Îro belavbûna nasnameya Kurd di asta cîhanî de bi saya fikir û keda Rêber Apo û PKK'ê ye.
Ji bo Rêber Apo azadiya wî ne astenge, lê belê xwasteka wê azadiya gelan e, ji ber vê yekî jî pêwîst e hemû sazî û dezgeh rabin ser piyan , kar û xebat bikin, herwiha hemû gelên şoreşger ji bo vê pêvajoyê berxwedanî û têkoşîna bêhempa bikin. Li Ewropayê hemû xwendekar û kesên xwedî bîr û bawerî pirtûkên Rêber Apo dixwinin û li ser vê pêvajoyê dimeşim. Herwiha danasîna Rêber Apo li Ewropayê tê dayîn, pir kêsên ku ji vê derê û Ewropayê bi rê ketin û çûn Tirkiyê ji bo ku bi Rêber Apo re hevdîtinê bikin."

# Parlamenterên Jinên Kurd: Cezayên darvekirinê rawestînin

**Navenda Nûçeyan**

**Parlamenterên Jinên Kurd bertek nîşanî erêkirina cezayê darvekirinê ya girtiya siyasî Şerîfe Mihemedî da û xwest ku Şerîfe Mihemed û hemû jinên girtî demildest werin berdan.**

Parlamenterên Jinên Kurd têkildarî erêkirina cezayê darvekirinê ya girtiya siyasî Şerîfe Mihemedî û girtiyên siyasî daxuyaniyeke nivîskî da. Di daxuyniyê de hate diyarkirin ku ew bi fikar û hêrseke mezin rewşa jinên li rojhilatê Kurdistanê û Îranê dişopînin û got, "Piştî qetilkirina Jîna Emînî û destpêkirina berxwedana "Jin, Jiyan, Azadî" rastî zextên giran, tundî, îşkence û girtinên sîstematîk tên. Ev polîtîkayên li dijî daxwazên jinên ji bo wekhevî, azadî û jiyanek



bi rûmet têne meşandin, ne tenê êrîşek li ser jinê ye, lê belê êrîşeke aşkere li ser mafên bingehîn ên tevahiya civakê ye. Rejîma Îranê bi armanca bêdengkirin û şikandina têkoşîna jinê, beden û hewldanên wan dike hedef, lê em bi bawer in ku ev zextên hovane nikarin li hember daxwazên mafdar ên jinê serkevin."
Di daxuyaniyê de hate destnîşankirin ku yek ji mînakên herî giran ên vê zordariyê jiyana Peşxan Ezîzî û Şerîfe Mihemed e ku bûne sembolên têkoşîna azadiyê û bi bîr xist ku Şerîfe Mihemedî ji sala 2023'an ve di girtîgehê de ye û piştî ku di sala 2024'an de biryara darvekirinê li ser wê hate dayîn û wiha domand: "Her çendî ev biryar di 12'ê Cotmeha 2024'an de hat betalkirin jî, di van demên dawî de careke din hate pejirandin. Ev biryar ne tenê tehdîdeke bêqanûnî li ser jiyana wê ye, lê belê nîşaneyeke eşkere ya şideta sîstematîk û polîtîkayên zordar ên rejîmê li dijî jinê ye. Tehdîda darvekirinê ku ji bo tinekirina dengê mafparêzên jinê tê bikaranîn, li dijî qanûnên navneteweyî, peymanên mafên mirovan û nirxên mirovî yên bingehîn e."
Parlamenterên Jinên Kurd bang li raya giştî ya cîhanê, saziyên mafên mirovan, tevgerên jin û hemû saziyên civaka demokratîk kir ku li hember van binpêkirinan bêdeng nemînin û wih pêde çû: "Bêdengiya li hember van kiryarên neadil, biryarên darvekirinê û girtinên bêbingeh dê rê li ber zilmên bêtir veke. Em daxwaz dikin ku civaka navneteweyî tavilê bikeve nav liv û tevgerê da ku mafê jiyanê yê Şerîfe Mihemed û hemû jinên di bin tehdîdê de ne biparêze, û ji bo rawestandina polîtîkayên zordar ên rejîma Îranê li dijî jinê, gavên bandorker bavêje."
Daxuyanî wiha bi dawî bû: "Têkoşîna azadiya jinê mafdar e. Em li kêleka jinên berxwedêr ên Rojhilatê Kurdistanê Îranê ne û em piştgiriyê didin dengê wan ên li dijî zordariyê. Em daxwaz dikin ku Şerîfe Mihemed û hemû jinên girtî demildest werin berdan û her cûre tundî, zext û tehdîdên darvekirinê yên li ser wan bên rawestandin. Em mekanîzmayên navneteweyî vedixwînin ku erka xwe bi cih bînin, ji ber ku em baş dizanin ku bêyî azadiya jinê, tu civak nikare bi rastî azad bijî."

# Xerîb Hiso: Konferans dengê pêkhate, ol û baweriyan kir yek

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Xerîb Hiso da zanîn ku Konferansa Yekhelwesta Pêkhateyan ne care yekemîn e ku tê lidarxistin, çawa di dîrokê de hemû pêkhate, ol û baweriyan di Sûriyê de hev parastin, ev gav jî nûjenkirina wê ye û got, "Tirkiyê êdî divê rewşa Sûriyê di aliyê çareseriyê de ber çacavan re bigre ne di aliyê xetmandinê de".

**Zana Roj/Qamişlo**

Konferansa Yekhelwesta Pêkhateyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 8'ê Tebaxî de hat lidarxistin. Têkildarî Konferansê û helwesta hikumeta veguhêz a Şamê, hevserokê Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê Xerîb Hiso bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Konferansa Yekhelwesta Pêkhateyan di demeke girîng de hat lidarxistin û dengvedanek di asta Sûriyê û cîhanê de ava kir. Gelo hûn vê gavê bi giştî çawa dinirxînin?**

Rewşa di Sûriyê de dişibe girêkeke ku zû ji hev nayê derxistin, bi şêwazê heyî ev girêk venabe û ev yek bi zanebûn çêdibe. Aliyek tenê dixwaze bi yek helwest, yek ziman, yek dewlet û siyasetê derkeve pêş, ev yek jî bi siyaseta şiddetê, înkar û tunekirinê tê naskirin. Mixabin hikumeta veguhêz a Şamê di dema heyî de, rola pêkhateyên di Sûriyê de ji dîrokê û heya niha di ber cav re nagre.

Rola hemû pêkhateyan di avakriina Sûriyê de heye û kes nikare înkar bike. Rola Kurdan beriya sed salî di avakirina Sûriyê de roleke sereke ye û pêşengtiya civaka Sûrî kiriye, pêşengtiya parastina civakan kiriye, herwiha pêşengtiya siyaseta Sûriyê kirine ku Sûriyê bibe Sûriyeke demokratîk, komara hemû pêkhateyan ku dîrok vê îfade dike. Rola Ermeniyan, Suriyaniyan, Durziyan û Elewiyan jî heye ku ev yek di çarçoveya Şoreşa Sûriyê a Mezin de hemûyan xwe îfade kirin û li hember dagirkerî û gefên li ser Sûriyê dihatin xwarin roleke sereke lîstin. Di dema veguhestinê de jî dema derketina Firansa ji Sûriyê jî Kurdan li kêlek Durzî, Elewî, Xiristiyanî, Sûryanî û Ereban cih girtine û karîne Komara Sûriyê ava bikin û ber bi aramiyê ve biribana. Lê yê ku rê li pêşiya vê yekê girt wê demê Partiya Baas bû. Du partiyan xwe kirin yek û li ser esasê perçekirin, talankirin, perçekirina civakê , dûrxistina olan û li ser vê siyasetê nijadperestî dan meşandin û Sûriyê kirin komarekî Erebî.

Niha piştî zêdetirî 60 salî li ser rêjêma berê, ev rêjîm hat rûxandin. Ew partî zêdetirî 60 salê li ser esasê rewşa awerte birêve dibir, çima rewşa awarte birêve dibir ji berk u pêkhate hebûn. Dema ku qanûna rewşa awarte derxistin armanc jê bêdenkirina pêkhateyan bû û hemû pêkhate kirin mêvan û koçber. Wê demê mafek ji koçber û mêvanan re di welatekî de dernakeve! Di aliyê maf û hiqûq de hemû hatin înkarkirin û di tunekirinê re derbas kirin.

Niha ev hikumeta veguhêz a nû li gorî veguheziyê nêz nabe, li gorî hikumteke ku xwe hemdem dibîne, him nijadperest û olperest her wiha xeta Baasiyan pêk tîne. Qanûna rewşa awarte pêk tîne û xeta nijadperestî û olperestiyê didomîne. Ji bo vê bi vê şêwazî ev hikumet nikare dewam bike, siyaset û netewperestiyeke rast ku hemû pêkhateyan di nava xwe de biparêze, nikare ava bike.

Konferansa ku hatiye çêkirin jî ne yekemîn care. Rêveberiya Xweser û pêkhateyên heyî di Sûriyê de ji hikumeta veguhêz kevintirin, di aliyê siyasî, exlaqî, civakî, çandî û dîrokî jê bi nirxtir û xurtirin. Û di têkoşîna azadiyê û demokrasiyê de jê bi hêztirin, ev yek jî çawa wisa bû bi pêşengtî û rola jin a diyarker di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de pêkan bû, ev yek jî di çarçoveya avakirina civak, însan çawa azad û demokrat be û pêşeroja avakirina Sûriyeke demokratîk çawan ava bibe diyar dike. Konferans jî li ser esasê pirrengî û yekîtiyê çawa ku di silogana wê de diyar bû, hat lidarxistin. Gelek konferans berê hatine lidarxistin lê ev bi taybet hinek cuda bû, ji aliyekê ve rastî nerazîbûnê hat û rûxmî wê jî bandora xwe çêkir, lê belê aliyên razî û piştgirî dan vê yekê weke mînaka yekem di Sûriyê de hat dîtin, gelek bûn. Li pêşiya raya giştî zindî hat weşandin, ji Siwêda Hukmet Hijrî û ji civaka Elewî birêz Xezal Xezalî jî tevlî bûn, herwiha xelkê Idlibê jî beşdar bûn. Di heman demê de li ser asta cîhanî, ji aliyê kesayetên bi bandor, rêxistin û siyasetmedaran ve hate pesnandin. Tenê yên ku pesna wê nedan ew kesayetên nijadperestin û hikumeta veguhêz bû ku vê yekê weke bedîlê xwe dibînin. Vê konferansê di asta cîhanê de jî dengvedanek ava kir. Di asta Sûriyê de dibê weke vê konferansê bi piştgiriyeke navnetewî bê lidarxistin. Ji ber her tişt vedigere peymana 10'ê Adarê, ê niha çima hikumeta veguhêz bendên wê pêk nayîne.

**Piştî Konferansê helwesta Hikumeta Veguhêz derket holê, hûn vê yekê çawa dibînin û gelo di mijara vekişandina Hikumeta Veguhêz ji civîna Parîsê destwerdaneke Tikî tê de heye yan na û hûn çawa dinirxînin?**

Helwesta hikumeta veguhêz li hember vê konferansê em şaş dibînin û ne di xizmetê de ye, dema ku civîneke wisa red dike tê wateya korkirina aloziyê. Tu feyda ji Sûriyê û hikumetê nîne ku vê helwestê nîşan dide. Weke hikumet dikarî pêşwazî bikira ev gav, dikarî bigota we çima gropek ji me venexwendiye. Eger rast bi çareseriyê re ye wê ev yek bikira, lê ger ji xetimandinê re be; wê daxuyaniyên wisa bide. Ji bo bike hincet û rê li pêşiya diyalogê bigire, got ez naçim Parîsê. Ev yek jî hincetin lawaztiye hikumetê ye, weke ku me xwestiye em hevdîtinan bikin û biçin Parîsê. Dewletên têkildar pişniyarkirine, hevdîtin li ku dibe aliyên gerentor diyar dikin, em dixwazin werin gel hev û em ji bo Şamê pir dixwazin, em çareseriya Sûrî Sûrî pişniyar dikin, ew bi Sûrî Sûrî hevdu dikujin. Dema ku aliyên gerentor hebin dixwazin alîkar bin û deriyê me ji bo çareseriyê jî vekirî ne, li ku dibe em ê bikin. Ev hemû ji bo pêkanîna bendên itîfaqa 10'ê Adarê tên kirin, lê hikumeta heyê xuyaye naxwaze pêk bîne weke ku poşman bûye, ger wiha be bila li pêşiya raya giştî bêje, ji ber ne bi dizî ev peyman hat îmzekirin.

Ji ber wê yekê jî destwerdana Tirkiyê li Sûriyê heye, di bingeh de Sûriyê ji Tirkiyê vala nebûye. Tirkiyê di dema rêjîmê, di şerê Sûriyê û niha piştî rêjîm rûxiya jî her di Sûriyê de ye, di terz û meşandina siyasetê de dibe hinek guhartin çêkiribe. Berê rasterast êriş, komkujî û sûç dikirin, lê niha bi rêya bikaranîna hikumetê dike. Di êvara ku ev konferans tê çêkirin Hekan Fîdan tê Şamê, dibe roja din helwest li hember komxebatê datînin û di roja din de dibêjin em li Parîs amede nabin. Ev hêz û îmkan te ji ku anî? Em dizanin ku ew ne xwediyê van hêz û helwestana ne. Ew ji me re dibêjin hûn ecîndatê dewletên derve ne, wê demê hûn ecîndatê kê ne? siyaseta ku bi rêya dewletên navnetewî tê hereketkirin nabe ecînde ango amûrek di destê kesî de. Ev konferans jî ji bo netewbûnê, ji bo çareseriyê xwe kiriye amûr. Di vir de hê jî roleke Tirkiyê yê neyînî di Sûriyê de heye, tirkiyê êdî divê rewşa Sûriyê di aliyê çareseriyê de ber çacavan re bigre ne di aliyê xetimandinê de.

**Bandora Tirkiyê li ser neçaresrkirina pirsgirêka Sûriyê, herwiha armanca wê ji van destwerdanan çi ye?**

Em û Tirkiyê cîranên hev in û pêkhateyên li gel me li gel wan jî hene tenê cografî hatiye perçekirin, ji ber wê jî em hev du baş nasdikin. Bi hev du re me salên durûdirêj di dîrokê de jiyan kiriye, lê tirkiyê keda hemû gelan û pêkhateyan înkar dike. Vê yekê di Sûriyê de jî dike. Niha Tirkiyê di welatê xwe de behsa demokrasiyê û biratiyê dike, lê di Sûriyê de viya nake û nahêle kesek behsa biratiyeke bi adalet bike. Tirkiyê bi banga Rêber



Apo ji bo aramiya Tirkiyê dest bi hin gava kiriye, Lê ji wa pêvajoya Aştiyê dibêje bila Sûriyê bandor nebe. Di kurkirina êriş û kawusan de aktîve, lê di çareseriyê de hîn kurtir dike. Ji ber wê yekê jî bi van destwerdanan nahêle ku aloziya Sûriyê çareser bibe. Bê guman siyasetekî wan li ser Sûriyê heye di aliyê herêmî de, mînak Israyîl, Îran, tirkiyê hebû her wiha Rûsiya û Emerîka heye ê Tirkiyê dibêje çima ez jî nîn bim. Ev ne pîvanekî siyasî exlaqî ye ne pêvanekî leşkerî exlaqî ye û cîrantiyê ye. Ji bo çareseriya Sûriyê divê Tirkiyê bibe hêzeke gerentor mînak ji bo civîna li Parîsê bê çêkirin Tirkan cav lê bûn û nehêşt çêbibe. Çima rê neda? Ma Tirkiyê li bendê ye ku Lozanekî din çê bibe, Civak niha li bendê ye ku Sîvereke din çê bibe. Divê Tirkiyê hinek di vir de xwe biguhere û bibe alîkar ji êşa ku Sûriyê kişandiye re. Ji bo vê pêvajoyê çawa ku îsrarek di Tirkiyê de heye divê di Sûriyê û Îraqê de jî hebe.

Di wê konferansê de her kesî ji hemû pêkhate, mezheb û olan, mesaj û hêviyên xwe diyar kirin, tişta ku divê ji vir û şûnda bê kirin çi ye?

Ev gav wê dewam bikin, çawa ku me di dîrokê de bi hev re jiyan kiriye, em ê niha jî bi hev re jiyan bikin û tu pirsgirêk di nav me de derneketine. Lê me got Rêjîma Baas her kes ji hev dur xist. Ji bo vê jî ev modela demokratîk e. Modela civaka demokartîk, avakirina exlaq û civakeke wekhev ev e. Çawa ku di dîrokê de hemû pêkhate, ol û baweriyan di Sûriyê de hev du parastin, niha ev nûjenkirina wê ye. Her kes di vê konferansê de bi zimanê xwe û çanda xwe tevlî bû. Pirrengiya ku hatiye derketin, ev konferans bi wate kir. Her wiha di tu welatan de bi tayebt di Rojhilata Navîn de tiştek wiha derneketiye, tenê di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dibe. Ev konferans bi ziman û mafê hemû pêkhateyan hat lidarkirin û di asta cîhan û navnetewî de bandor kir. Her wiha di Konfransê de hemû beşdarvana yekgirtin û piştgiriya xwe ji Hêzên QSD'ê re tekez kirin ku QSD'ê hêzekî netewî ye. Di heman demê de di encamnameya dawiyê de her kesî piştgiriye Yekrêziya Sûrî Sûrî kir ku divê Sûriyê her kesî di nava xwe de hembêz bike.



## Sûriyeya HTŞ'ê di bin dagirkeriyê de ye!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk a dagirker bi salane ji bo girtina xaka Sûriyê û pêkanîna Mîsaqa Milî kar û xebatan dide meşandin. Ji despêka serhildana gelê Sûriyê ve di gelek qadan de destwerdan kir. Bi gelek navên cuda komên çete ava kir. Ew bi çek û cebilxane kirin, perwerde kirin, sînor vekirin û hemû cûreyên alîkariyê ji wan re pêşkêş kir. Destwerdana dewleta Tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde bû. Sîstema heyî ya Sûriyê û alîgiriya wê ji Îran û Rûsiya re ne li gorî dilê desthilata Tirkiyê bû. Bi destwerdan û dagirkirinê xwest rewşê bide guhertin. Alîgirên xwe bîne ser desthildariyê û planên xwe li ser xaka Sûriyê bi cib bîne. Ji bo pirojeya xwe li Sûriyê feriz bike, DAIŞ'yên li ser tevahî cîhanê metirsîdar bûn, ava kirin. Bi dehezaran çeteyên biyanî derbasî xaka Sûriyê kirin. Ji bo xwe hemû tişt li dijî gelê Sûriyê dan meşandin.

Bi hilweşîna hikûmeta serokê berê yê Sûriyê Beşar El Esed re, alîgirên Tirkiyê di tevahî Sûriyê de serwer bûn. HTŞ'ê û Serokê veguhêz yê Sûriyê jî di nav de hemû movikên dewletê ketin destê dewleta Tirk a dagirker. Civaka navdewletî xwestin desthilata HTŞ'ê nas bikin û derfetek cidî danê. Di asta herî jor de hevdîtin, rê dayîn û piştgiriya dîplomasî pê re kirin. Lê ji ber belavbûna desthildara HTŞ'ê nikarîbû komên çete yên dewleta Tirk ew xwedî kirine, kontrol bikin. Ji lewma li Perava Sûriyê û Siwêda komkujiyên mezin pêk hatin. Di Sûriyê de kîndariya li dijî kurd, durzî, elewî û pêkhateyên din mezin kirin. Li dijî Rêveberiya Xweser û QSD'ê şerê pskolojî û êrişên leşkerî dan meşandin, hîn jî didomînin. Şaneyên DAIŞ'ê zindî kirin. Ji ber wê jî ev çend mehin çeteyên DAIŞ'ê bi sedan êrîş li dijî herêmên Rêveberiya Xweser pêk anîne.

Dewleta Tirk bi destwerdana xwe riya çareseriya aloziya li Sûriyê asteng dike, HTŞ'ê û komên din ên çekdar ku xistine di bin banê "Wezareta Parastinê" ya heta niha nikare yek koma çekdar kontrol bike, li gorî siyasetên xwe birêve dibin. Nahêlin aramî û ewlekarî li ser xaka Sûriyê pêk were. Tirkiyê rê nade danûstendinên di navbera Rêveberiya Xweser û desthilata Şamê de bi rê ve biçe. Tevî di dehê Adarê de di navbera Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdê û Serokê Veguhêz ê Sûriyê peymanek bi çavdêriya aliyên navdewletî hate imzekirin. Tevî QSD'ê û Rêveberiya Xweser ji bo pêkanîna xalên wê gelek gav avêtin. Dewleta Tirk a dagirker ku mejiyê rêveberiyê yê HTŞ'ê û komên çekdar dagirkiriye û wan bi rê ve dibe, danûstendinan asteng dike. Rê nade sponseriya siyasî li Sûriyê bi rê ve biçe. Tevî hêzên mezin ên wekî Amerîka, Fransa û hin welatên din gotin ew derfetê didin hikûmeta veguhêz a Sûriyê, dewleta Tirk bi destwerdana xwe nahêle gav werin avêtin. Li aliyê din jî hikûmeta Veguhêz mecbûrî pirojeyên aborî yên tu sûdê li gelê Sûriyê nake. Welatekî jêrzemîna wê hilweşiyaye wekî Sûriyê hewcedarî alîkariyan e, Dewleta Tirk bi pirojeyên xwe yên aborî bi hikûmeta HTŞ'ê re dixwaze hêza tişta mayî ji xwîna gelê Sûriyê bimije.



# 'Divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekbûyîna pêkhateyan ava bibin'

Sekretêrê Partiya Demokratî Kurd li Sûriyê(Partî) Nesredîn Ibrahîm da zanîn ku Konferansa Pêkhateyan gavek pratîkî, ji bo hevnêzîkirina nêrînan, xurtkirina baweriya hevbeş bi rêya diyaloga rasterast û naskirina maf û erkên hevbeş bû û got, "Divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekgirtina pêkhateyên tevahiya Sûriyê ava bibin"

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Konferansa Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdariya pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryanî, ermenî, Tirkman û Çerkez di 8'ê Tebaxê de hat li darxistin, herwiha nûnerên gelek sazî, rêxistin, hêz, partiyan lê amade bûn.

Girîngiya vê konferansê di demeke wiha de ji hêla hemû gelên Sûriyê ve bi erênî hat nirxandin. Herwiha hêviya gelên Sûriyê ku encamên vê konferansê li ser rûyê erdê pêk were, xebateke hevbeş piştî lidarxistina konferansê were meşandin da ku xurtikirina têkiliyan di navbera pêkhateyên Sûriyê de çêbibe. Derbarê heman mijarê sekeretêrê Partiya Demokratî Kurd li Sûriyê(Partî) Nesredîn Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

**'Konferans gaveke piratîkî ji bo diyaloga hevgirtina pêkhateyan bû'**

Nesredîn Ibrahîm da zanîn ku Konferansa Pêkhateyan gavek pratîkî, ji bo hevnêzîkirina nêrînan û xurtkirina baweriya hevbeş bi rêya diyaloga rasterast û naskirina maf û erkên hevbeş bû û wiha got: "Konferansê qonaxek girîng di xurtkirina têkiliyên di navbera pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de nîşan da û rê da nûnerên Kurd, Ereb, Suryan, Tirkmen, Ermenî û yên din li ser yek maseyê bicivin da ku li ser mijarên hevpar gengeşe bikin. Ev komcivîn ne tenê boneyek protokolê bû, lê gavek pratîkî, ber bi hevnêzîkirina nêrînan û xurtkirina baweriya hevbeş bi rêya diyaloga rasterast û naskirina maf û erkên hevbeş. Bi riya vê bûyerê, peyamên zelal ji civaka Sûriyê re bi tevahî hatin şandin ku naveroka wê ew bû ku aramî û jiyana hevbeş tenê bi riya hevkariyê dikare were bidestxistin û her hewldanek ji bo dûrxistina yek pêkhateyê, dê bandorek neyînî li ser her kesî bike."

**'Pirsgirêkên têkildarî nûnertiya siyasî, civakî û çandî çareser bûn'**

Ibrahîm tekez kir ku pisgirêkên têkildarî nûnertiya siyasî, civakî û çandî yên pêkhateyan bi konferansê hat çareserkirin û wiha domand: "Konferansê ji civaka navneteweyî re amaje kir ku ezmûna piralî li herêmê ne barek e, lê belê derfeteke ku dikare wekî modelek ji bo çareseriyeke berfirehtir ji bo alûziya Sûriyê xizmetê bike, eger piştgirî û naskirinê werbigire. Her çend konferans di ronîkirina hin ji pirsgirêkên têkildarî nûnerayetiya siyasî û civakî û parastina taybetmendiyên çandî û olî de serkeftî bû jî, ew li seranserê Sûriyê berfireh nebû, lê belê, tenê destnîşankirina van pirsgirêkan û bi rengekî vekirî bi hemî aliyan re gavek yekem e ber bi biryarên berfireh û cîbicîkar ve."



**'Divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekbûyîna pêkhateyan ava bibin'**

Sekretêrê Partiya Demokratî Kurd li Sûriyê(Partî) Nesredîn Ibrahîm bal kişand ku divê komîteyên hevbeş ji bo meşandina xebata yekgirtina pêkhateyên tevahiya Sûriyê ava bibin û wiha bi lêv kir: "Ji bo ku biryar û pêşniyar tenê li ser kaxezê nemînin, divê ew bi avakirina komîteyên şopandinê yên hevbeş, destnîşankirina demeke destnîşankirî û misogerkirina beşdariya rêxistinên civaka sivîl di çavdêriya pêkanînê de, were destnîşankirin. Herwiha zelalî di eşkerekirina encaman de ji raya giştî re faktorekî sereke ye di parastina baweriyê de. Li ser asta bernameya pratîkî, zêdekirina beşdariya bi bandor a hemû pêkhateyan hewceyî veberhênanê li projeyên perwerdehî û çandî dike da ku nirxên pirrengiyê bi cih bîne, di gel planên pêşketina aborî ya dadperwer ku newekheviyên herêmî kêm dikin. Di heman demê de pêdivî heye ku saziyên rêveberî û siyasî werin pêşxistin da ku nerm bin, nûnertiya rasteqîn a pêkhateyan gengaz bikin û standartên zelaliyê û yekparebûnê bi dest bixin. Li aliyekî din rê li ber înîsiyatîfên ku ji hêla ciwan û jinan ve têne rêvebirin, vekin da ku jiyana siyasî û civakî vejînin. Li aliyê ewlehiyê, zêdekirina hevkariya di navbera pêkhateyan de di rêveberiya ewlehiyê de dê faktorek girîng be di avakirina baweriya hevbeş û parastina tevahiya ezmûnê de, lewma jî divê ev alî jî were xurtkirin."

## Fermandar Nûreddîn Sofî...



**Zekî Bedran**

Nivîsandina jiyana hîn mirovan gelek zehmet e. Tû di navbera nivîsandin û nenivîsandinê de diçî û tê. Tu difikirî ka gelo peyvên ku tu bikar tînî têra xwe ne ku wan bi nav bikî, an jî ew ê bibin sedema windakirina wateyê. Hin kes pir taybet in. Çiqas dilnizm bin jî, çiqas xwe ji yên din cuda nebînin jî, ew cuda ne, pir cuda. Ji bo ku hûn maf li wan bikin, divê hûn wêjekar an jî nivîskarekî baş bin. Em ne nivîskarên baş in û ne jî wêjekarê baş in. Di vî warî de, em bawer dikin ku ne gengaz e ku meriv nenivîse; em çiqas bêtir di nivîsek kurt de vebêjin, ewqas guncav e. N. Sofî li Rojava, beşa herî biçûk a Kurdistanê, ji dayik bû. Zarokatiya xwe û xwendina xwe ya navîn bi malbata xwe re derbas kir. Piştî ku çû zanîngehê, ji bo xwendinê ji malê derket. Di salên zanîngehê de, bi awayekî çalak beşdarî çalakiyên PKK'ê bû. Xebata wî ya ciwanan êdî têrê nedikir. Ji bo tevlî tevgerê bibe, dev ji dibistanê berda.

N. Sofî kesekî pir bitevger e. Ew xwedî asteke bilind a zanebûnê ye. Ew pir zirav û meraqdarê derdora xwe ye. Ew girêdayi nirxên hevaltiyê ye. Ew ji xwendin û lêkolînê hez dike, çalak e û mirovekî zindî bû. Bi van taybetmendiyan, em dikarin bibêjin ku ew di şibe Kemal Pîr. Bi fedakarî, dilsozî û wêrekiya xwe, cêwiyê Kemal Pîr e. Kemal Pîr Apoîzmê heta navikê nûnertiya wê kir, mîlîtantiyek bêrawestan kir ku sînor nas nedikir.

N. Sofî di heman demê de dişibihe Mazlûm. Ew mîlîtanek piralî ye ku ji xwendin û lêkolînê hez dike. Ew kesek e ku dibêje, "Ez nizanim ez ji bo PKK'ê me, lê PKK'ê ji bo min e." Gava ku ew tevlî dibe, ew bi tevahî tevlî dibe, bê sînor xwe dide. Di nav vê jiyana mijûl, pratîka dijwar, lez û bezîna domdar de, ew ji bo wêje û helbestê jî dem vediqetîne. Cîhana wî ya hûndirîn pir dewlemend e. Ew di heman demê de zarokekî veşartî ye ku qet mezin nabe. Ew yek ji wan kesên kêm e ku resentiya zaroktiyê, paqijî û bêgunehiya cîhana xwe ya hundirîn parastiye. Ew pir dilnizm bû û xizmetkirina ji heval û gelê xwe re wek bawerî û ol didît. Ew kesekî bêwestan û bêsînor bû ku diçû her derê ku jê re pêwîstî pê hebû ya.

Nûredîn Sofî bi coş û bê dudilî xwe avêt çiyayan. Bi rastî jî bi wan ve hat girêdan. Xortaniya xwe, salên herî zindî yên jiyana xwe, li çiyayan derbas kir. Bi zimanê çiyayan diaxivî û mîna bayên wan difiriya. Di demek kurt de, hem ji hêla zanistî ve û hem jî ji hêla laşî ve bû mirovekî çiyayî. Pabendbûna xwe ya bi azadî û gelê xwe re hîn xurttir kir. Jîrbûn, xebata wî ya dijwar û tevgera wî ew kir gerîla û fermandarekî jêhatî. Ewqas ku ew ji bo fermandariya biryargeha giştî ya HPG'ê hat hilbijartin. Ji ber ku di temenê xwe yê ciwan de ji perçeya herî piçûk a Kurdistanê tê, bê guman, bûyîna fermandarê giştî yê HPG'ê ne erkekê hêsan e. Sofî nirxên bingehîn ên mirovî û xisletek exlaqî ya bilind bi dest xist. Wî her tiştê ku dizanî bêyî dudilî pêşkêşî hevalên xwe kir. Xwediyê têgihîştinek pir afirîner û bihêz bû ku bi lez û bez li herêm û civaka ku ew serdana wê dikir dikevt di nav de û xwe li gorî wê amade dikir. Wekî ku pir caran li ser wî tê gotin, ew hem piçûk û hem jî mezin bû. Dema ku hûn bi wî re bûn, mirov xwe ewle hîs dikir. Her tiştê ku pêdivî pê hebe li cem wî hebû. Ew ê tiştan bibîne, bi hev ve girêbide, biafirîne û pêk bîne. Ew ê ji xwe bêtir li hevalên xwe û kesên li dora xwe bifikire û wan biparêz e. Sofî xwedî zanebûnke kûr a dîrokê û hêzeke şîrovekirinê ya bihêz bû. Ew fermandarekê xwedî jêhatîyên pratîkî û leşkerî yên bihêz bû. Ew di heman demê de yek ji wan kesan bû ku xwe ji hêla teorîk û bîrdozî ve pêş xist.

Fermandar Sofî teqezî li ser yekîtî û hevgirtina gotin û pêkanînê kir. Divê zanebûna wî ya bi felsefeyê jî neyê jibîrkirin. Em qala gerîla, fermandar û pêşengekî dikin ku cîhana wî ya hindûrîn bi zanist, civak, wêje û hunerê ve bi kûrahî ve girêdayî bû. Lewra dema ku ew ji serê çiyayan daket Rojava û deştan jî, wî taybetmendiya xwe ya mîna baz parast. Nûredîn Sofî pêşengekî rasteqîn ê civakê bû. Ew qet ji aliyê mejî û ramanê ve ji wan dûr neket. Ew zû bi wan re bû yek. Ew beşdarî avakirina komun û meclisan bû, û di hemî rêxistinên ku bingeha Rêveberiya Xweser danîn de rolek pêşeng lîst. Fermandar Sofî di operasyonên leşkerî yên di asta herî bilind de jî rolek pêşeng lîst. wî di têkbirina DAIŞ'ê û avakirina YPG û QSD'ê de gelek ked da. Bi şoreşa Rojava re, wî di dilê gel de wekî şoreşgerekî yekgirtî û ronakbîr li seranserê Kurdistanê cih girt. Ew tenê ne fermandar û milîtanê Rojava, bû, lê ew yê tevahiya Kurdistanê bû. Her dem û li her derê, şopîner û şervanekê rastîn yê Rêber Apo bû. Baweriya wî bi rêya azadiya jinan a Rêbertî hebû û hewl dida ku bi hevalên xwe yên jin re bibe rê heval. Ne guncaw e ku mirov şehadeta Sofiyê wekî stêrkekî di nav me de çû bi nav bike. Ew dizane ku ew ê di dil û têkoşîna gel û hevalên me de bijî. Erka me ew e ku em mîretaya Sofiyan bilind bikin…..



## Dagirkirina Hiş

**Farûk Sakik**

Pêngava-serdema aştî û civaka demokratîk giranbe jî dimeşe. Di vê serdema nû ya hatî destpêkirin de dema gav tên avêtin, an jî daxwiyaniyek tê dayin, bi xwe re gelek nîqaşan dide destpêkirin.

Herî dawî Rêber Apo, di hevdîtinek xwe de peyva 'entegrasyona demokratîk' kir. Nayê wateya asîmle bibî. Tirkbûnê qebûl bikî. Bi vê entegrasyonê tevlî netewa Tirk nabî, tevlî dewleta Tirkiyê dibî. Dewletek çawa? Dewletek demokratîk. Kurd û Tirk di vê dewletê de wekhev, xwedî heman statu û mafan e. Dewlet, netew nîne. Dewlet sîstema rêveberiyêye. Di vê dewletê de gelek netew hene. Di vê pêngavê de, Rêber Apo li ser navê Kurdan, bi Devlet Bahçelî (dewletê temsîl dike) û Erdogan (hikumetê temsîl dike) re, dimeşîne.

Bahçelî ji bo pêşeroja 'dewletê' vê pêngavê û paradigmaya Rêber Apo erê kir. Erdogan jî ji bo berdewamiya desthilatdariya xwe, tevdigere û hênjî sedî sed tevlî vê pêvajoyê nebûye. Dema dît ku ew di siyaseta Tirkiyê ya navxweyî de nikare midaxleyî pêngavê bike, bi hemleya, Hakan Fîdan a midaxlekirina Sûrî, dixwazê bazariyan bike. Şantaj û gefxwarina li ser Rojava jî parçeyek vê bazariyêne. Bi kurtasî dixwaze pêngavê li gor berjewendiyê xwe bikarbîne.

Erdogan dizane heger demokrasî were vî welatî, wê desthilatdariya wî bikeve bin xeteriyê. Dîsa dizane êdî dijminatiya bi Kurdan jî pere nake. Qebûl dike ku Kurd ne tenê li Tirkiyê, li Rojhilata Navîn xwedî hêzek mezinin. Lê civaka xwe wê çawa îkna bike. Hişê civakê yê ku bi nîjadperestî hatî jahrîkirin îro li sere wî buye bela. Di dîrokê de bi hişmendî û kodên civakê gelek hatiye leyîztin. Mînak; di destpêka salên 70 de Denîz Gezmîş û Mahîr Çayan û hevalên xwe ji bo Tirkiyeyek serbixwe û bi hêzên emparyal ve ne girêdayî dixwestin. Ew wek kominîst bi navkirin û civak li dijî wan sor kirin. Gotin vana dixwazin bi komnîzmê dînê me ji dest me bigirin. Kurdan jî bi PKK'ê doza mafên xwe kirin. Gotin vanan welatê me parçedikin. Ev terorîstin, eşqiyane. Ango di her serdemî de dijminek di mêjiyê civakê de bicîh kirin. Erdogan difikire, ew vîrûsa ku li dijî Kurdan, di serê civakê de hatî bicîhkirin, êdî zehmete di demek kurt de ji mejiyê civakê were paqijkirin. Ji bo vê yekê dixwaze vê vîrûsê îroj bi derewan xûrtir bike.

Li ser vê hişmendiyê, vîrûsa dagirkirina hiş, nîrxandinek Rêber Apo heye, dibêje: "Heger îkonên, neteweperestî, olperestî, zayendîperestî, werzişvanî û hunermendî belavbikî, dikarî girseyê ji bo armancên xwe birêve bibî. " Dagirkirina hiş, civakê her çiqas bi bandor be jî, bi van têgehên jor, dikarin vê hişmendiyê ji bo pêvajoya îro jî bi erênî bikarbînin. Ev yek jî cesaret dixwaze, lê ev cesaret bi AKP'ê re tuneye. Herkes ji aliyê xwe ve zimanekê bikar tîne, ji aliyê hikumetê vê pêvajoyê her wek bi tenê PKK'ê bêçek kirin pênase dike. Rêber Apo jî ev pêngav wek serdema, aşitî û civaka demokratîk' binavkir. Bersivek wî jî, ji binavkirina Tirkiya bê teror' bû. Peyva, aştî' bi zanebûn li vêderê bicîh kiriye. Aştî; di navbera du aliyan de pêktê. Du alî şer dikin û piştre lihev dikin û aşitî tê îlan dikin. Li vêderê dewlet jî êdî bêçek bûye ( di şerê li dijî PKK'ê de). Êdî, aliyê dewletê dikare bi cesaret peyva aşitiyê derxe pêş. PKK rojek biryar negirt ji bo terorê derneket çiyê. Ji bo mafên Kurdan derket û şer kir, dewletê jî di politîkayên xwe yên sedsalî de israrkir û şer kir. Ev rastî divê ji civakê neyê veşartin.

Divê Erdogan jî wek dewletê û Rêber Apo bi cesaret be.